Ew aşê derav lê wargêray bexçikek êşê dişewitîne

Kerem Îbrahîm El-yosiv keremyusiv@hotmail.com

Anuha bandora jiyana çi kesê kurd bi paşerojê heye, ew paşeroja ku her kesê kurd ji ber wê dinale û her ew yekemîn kul û azerên wî ne.

Tê gûmankirin ku ji ber paşeroja kurdî tevî hemû qurbanên wê bo azadî û serxwebûnê negihîşt wan armancan. îro kesê kurd ji ber negihiştina wan armancan azeran dixwe, lewra distirêne, dinivîsîne, şêwekariyê dike.

Ne ji xisletên min bû ku ez bibim pesindarê tu romanê lê ez dibînim ku ji mafê mirove eger romanek hêja xwend bi qencî behsa wê bike, romana Ew aşê deravê

wergêray a romanvan Nacî Taha Berwarî hat da ku li ser paşeroja kurdî bibe bawermendiyek nivîsî, wêjeyî û ne siyasî. Hibijartina romanvan ji dem û êşên romanê re dihêle ku mirov hinekî li ser wê paşerojê bi-rame, çimkî nivîskar riyek din dît bo xwe bighîne dilê xwendevanê xwe ên ku ez yek ji wan im.



Romanvan, tawergehê romanê her û her bi kevnesalan girêdide ên ku di nerîna wî de, demek baş bûn bo pêşerojek kurdî dewlemend û tijî pend, di vir de ez dikarim bêjim: Kû çi milet li ser rûyê vê qadê, eger pendê pîremêran di dîroka wî de nebin, dîroka wî jê bi fedî ye, lewra wî xwest ji ser miletê xwe rahêje vê fediyê dema ku wî her çend rûpel bi pend û metelokan mîna: dewê cerpandî baştire ji mastê ne cerbandî. Nîşan dikirin.

Dema ku romanvan dîrokê derbasî romanê dike, tê gûmankirin ku xuyanekirina rastiyekê di dûv wê de heye û pêdivî ye li ser romanvanan ku wê bide xuyakirin, çendî derfet teng be, wî Mîdî bi hespên wan ku li ber çavên xwendevan hê û hê dibezin derbasî romanê kirin, ta bigehin armanca siwarê xwe yê kurd, dema dibêje: Kurd binyatêd Mîdiyane.

Romanvan her dixwaze ku kesê kurd li ser dîroka xwe bipirse û xwedî lê derkeve, dema ew ji birayê xwe, li ser Mîdiyan dipirse, ew wiha me vexwendî dike ku em xwedî li dîroka xwe derkevin Mîdiyan zordarî li kesî nedikirin, bitinê ji bo mana xwe dikirin...

Rengê sor ê ku nîşana alên gelek miletane, nerînek romanvan cuda tê de heye, nerîna wî ewe ku ev reng bo zordariyê ye, bo şer û kuştinê ye, dema ew li ser vî rengî dibêje: Rengê sorê qirêjî.

Romanvan dixwaze ku ji nû ve cîhanekê ava bike lê cîhanek ku kurd tê de serbest bin û roleke din tê de bileyzin, herweha ew nimûneyên sax diyar dike mîna: Mele , axa, berjewendevan, eger van



nimûneyan kar bo kurdayetiyê kiribana, dê rewşa kurdî anuha ne ev rewş ba, belê di kurahiya hevokên romanê de ew bêhna şoreşî heye, ev nimûne ku rolek neqenc lîstin, rola wan dîsan heye û romanvan bi pênûs û dilekî bi şewat dinivîsine, dema dibêje: Demên alozî di tevnê jiyanê de peyda dibûn da bi sanahî şêm jêk vavêrim, hertştekî, her kesekî li cihê wî deynim, gelek ya bi zehmete, ez xwedanê vî sere biçûk bişîm hemî pêzanînên gerdûnê kom bikim û kar yê bikim, ev demên em tê de dijîn, her demjimêrek kirasekî diguherêt.. Bêhna gerdûna nû ji hevokên wî ên nema di hundirê sînoran de dijîn dibare.

Tenha Bi gotinê, romanvan cîhaneke nû li ser rûpelên romana avadike, da komara kulan û bendewariyê bi gulan û pîrozbahiyê bê damezirandin, belê mafê wî heye ku bêje: dengê damezirandina komarê, bûye xonav û hemî spîdehiya siwêretî nazikê gul û rihan û sîsen û beybîna maçî diket, bûye silavê li hemî dîm û rûyan diket.

Peyv li nik nivîskar şoreşe û ew bitehna xwe dikare mirovahî û wekheviyê vegerîne vê gerdûnê lê peyva ku romanan li ser dixife peyva kurdî ye: ev peyv, girnjîne, elende, paşeroje, ev peyv ! (**Şoreşe, berxwedane, serhildane li kurdistanê**).

Jiyan li nik romanvan, ji sê qonaxa ye û ew bûn, jinanîn, mirin û ne tenha jiyan mi-

rov diguhere lê gelek caran jî mirov jiyanê diguherêt.

Hevoka ku wî dixwest ji dijminê kurdan re bêje ev bû û ew da ku dijmin nasbike, ku zindan û mirin, kurdan tune nakin, lê her ew hene û ew dozê bihêz dikin: ne bi eşkencedanê ne bigirtin û kuştin û sêdaredanê, miletê me yê zindî û resen dimrît, ne şopa wî dihête guherîn, ne nasnama wî dihête berzkirin.

Romanvan ku behsa deverên êşê di gewdeya kurdistanê de dike, ji bîr nake ku li ser rûpelên romanê bi destê helbestên Ehmedê Xanê bigre bo di romanê de beşdar bibin, wiha ew ji kesên comerd re, bo mafê kurdan dema ew beşên ji helbestên Ehmedê Xanî têne nêzîk ji dilê rûpelê, biramana xwe dilsoz dimîne.

Da ku xelq nebêjin ku ekrad Bê meerîfet bê esl û binyad

Herweha romanvan ji bîr nake ku bi destên roj û heyvên pak ên damezrandina komara Mehabad bigre da ku ew kêlîk bêtir nêzîk be ji canê romanê, da ku li ser damezrandina komara kurdî li Mehabadê binivîsîne, Eve ji baxê çermisî, gulek geş bû, eve ji ewrên sitewir, taveyek barî...

Romanvan xweziyên xwe li ser rûpelan dike, xweziyên ku yekemîn car di nav rûpelan de, ne di gulîstanan de têne çandin, Xwezî ez şiyabam, bibime perdeyek û min nehêlaba, rondikên çavên zarokên me, siwêretên wan hingavtban!!

Xwezê ez şiya bam gul û bêhna min barûa kujek, hemî helkêşaba!!

Lê dema ew xweziyên xwe bi dawî tîne, ji bîr nake ku vê demê, xwezî tu mafê nade miletan, lê li gel xweziyan pêdivîya bi kar heye.

Belê... Ne serdemê xoziyane, serdem û bikaranîna hizir û bîranînê..!

Çendî romanvan xwest ku bazde û li gora hêvî û xweziyên xwe romanê tewaw bike, welat azad bike, lê pênûsê zor lê dikir da ku ew romanê siha bidawî bîne mîna ku ew hê xwe bi xwena xwe ve girêdide û naxwaze şiyar bibe. pêdivî ye aşê bêtir û baştir bideyne nasîn, bi diravên zelal û êk girtî, bêxîne kare, nîşaneke çwar reng pêvekeyn, li civata bilind korsîka xwe danîn, bi navê hêmayadeyk biaxifeyn..